Ji Penûsê Jinê Rastîya Jîyanê

RAPERÎN

Dîrok: Sibat 2025 Hejmar:15 Biha: 1000

Adarê

PÎROZ BE!

Em ê şoreşa xwe

BIPARÊZIN

ROJEV 2 Em Bi Îtîfaqa Jinê Şoreşa Jinê Biparêzin

NEZERÎ 3 Em ê Bi Agirê Dîroka 8ê Adarê Şoreşa Xwe Biparêzin

JINA CIWAN 7 Ala Rojava Hilde Şoreşa Jin Biparêze!

Em Bi Îtîfaqa Jinê Şoreşa Jinê Biparêzin

Ji 8ê meha Kanûnê pê ve li Sûrîye heyameka nû dest pê kir. Rejîma Esad hilweşîya, Heyet Tahrîr El Şam (HTŞ) a îslamker a polîtîk a faşîst di Şamê da bi cih bû. Di mijara bi destveanîna HTŞê ya Şamê da rola Emerîka, Ingilîstan, Erebîstana Seûdî, Îsraîl û Tirkîye dîyarker bû. Ev di heman demê da preferansa (tercîh) stratejîk a hêzên emperyalîst û dewletên paşverû yên herêmê ye. Wekî ku tê îdîakirin xemeka wekî şêweya jîyana gelên Sûrî, mafên jinan, mafên mirovan û rêveberîya laîk (sekûler) a van dewletan tune ye. Colanî di sala 2012an da ji bo avakirina DAIŞê hatîye Sûrîye. Sûcên mirovatîyê yên ku DAÎŞê li dijî mirovên ji hemû bawerîyan ên ku bîatî DAIŞê nekirine pêk anîne tên zanîn. Kiryarên DAIŞê yên wekî revandina jinan û firotina wan jî tê zanîn. DAIŞê, bi kiryar û sepanên heyama cahilîye hewl da ku li ser jinan û gelan sultetîya xwe ava bike. Hîna jinên ku ji Şengal, Efrîn, Reqa û hwd. hatine revandin û aqûbeta wan ne dîyar hene.

Weke HTŞê guherîna DAIŞê nayê wateya guherîna bîrdozîya wê ya dijminatîya jinê û polîtîkayên wê. Di 'konferansa serkeftinê' ya ku Colanî tê da xwe weke serokomar îlan kir da cih negirtina qender jinekê jî encama vê bîrdozîyê ye. Her wiha cihgirtina kujerê ku di sala 2019 an da di qetilkirina Hevrîn Xelef da rol lîstîye adeta bû mohra xeta dijminatîya jinê ya HTŞê. Wezîra jin a ku ji Tirkîye anîne jî hîna di beyanên xwe yên yekemîn da mêjîya xwe ya mêrperest û HTŞê xist holê.

Ji alîyê HTŞê ve bi rêya şkenceyan hatin kuştina jineka ciwan a akademîsyen ku ji bo mafên elewîyan têdikoşîya, rakirina tola ji jinên şoreşger, pêşverû, jinên ku têkoşîna mafan didin meşandin an jî tola ji jinên ku naxwazin li gorî zagonên şerîetê bijîn e. Ev ne bûyerên munferit in, berevajî kodên rejîma îslamker a polîtîk a faşîst ku dixwazin ava bikin in. Em bi avakirina rejîmeka nû ya cîhadîst, kapîtalîst û mêrperest ve ê rû bi rû ne.

Destpêkê dewleta Tirk a mêtingehkar, înkarker faşîst û dewletên emperyalîst ên ku HTŞê anîn Şamê, dixwazin şoreşa me ya Rojava, Rêveberîya me ya Xweser a Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûrîye entegreyî HTŞê bikin. Di pergala mêrperst a HTŞê da ev rastî tune ye ku jin bibin pêkhateyên wekhev ên rêveberîyê û di heman demê da bi rêxistinbûna xwe ya xweser di vê rêveberîyê da cih bigirin. Ji bo wan malbata pîroz ku serektîya wê mêr dike ji bo jinan cihê herî baş e. Ji bo wan erka jinê welidandina zarokan û kêfxweşkirina dilê mêran e! hîna zêdetir maf, jinê û civakê xirap dike. Ev rastî jinê xirap nake, lê avanîya civakî ya mêrperest xirap dike. Ji ber ku avanîyên civakî yên ku tê da serdestîya burjuva ya feodal û serdestîya mêr heye civakên herî bêexlaq û bênamûs in.

Bi kurtasî em di bin dorpêça bîrdozîyî, polîtîk û leşgerî da ne. Di navenda êrîşan da destkeftinên jinê hene. Kesî ev şoreş nebexşandîye me. Ji bo ku vê şoreşê bi dest bixin jinan li her derê şer kirin, ji bo avakirina wê kedeka mezin dan. Di her bostek axa vê şoreşê da xwîn û keda jinê heye. Bêguman em ê weke duh îro jî şoreşa xwe biparêzin. Li Tişrînê, li tevahî xetên cepheyan, bajar û gundan berxwedanîya canfida ya şervan û gelê me û biryardarîya wan a ku rê nade dijmin mînaka vê ye.

Encax ev careka din tê dîtin ku pergala serdest a mêr pergaleka cîhanî ye. Kokên wê di merhaleya destpêka civaka biçîn da ye. Û heta ku di tevahî cîhanê da kokên serdestîya mêr neyê ziwakirin jîyana azad û birûmet a jinan di bin xeterîyê da ye. Hema li cihekî cîhana mêrperest bilindbûna ala şoreşa jinê têra hilweşandina ev pergala serdest a mêr nake. Divê şoreşa jinê pêl bi pêl belavî her derê bibe û nexşeya cîhanê bizivire rengê jinê.

Şoreşa Rojava destpêkeke, wargeheka jinan e. Lê pêwîst e ku ev wargeh zêde bibin û qadên xwe yên serdestîyê berfireh bikin. Û divê her yek ji wan bi parastina ya din serdestîya xwe dabîn bike.

Ji bo Parastina Şoreşa Rojava!

Ji bo vê ya yekemîn Pêwîst e ku asta rêxistinîbûna wargeha şoreşa Rojava ya jin berfirehtir û kûrtir bibe. Divê tu jin bêrêxistin nemîne. Divê jin di komîn, meclîs, artêş, asayîş û Hêza Cewherî da hîna zêdetir rêxistin bibin.

Divê em weke JKŞê di nava karmend, karkerên çandinî, kedkarên malê û jinên xwendekar da rêxistinbûna xwe hîna zêdetir xurtir bikin. Divê em bi rojnameya xwe ya Raperîn û belavokên xwe derî bi derî bigerin xwe bigêhênin jinan. Divê serlêdanên malan û kargehan, civîn, perwerde qet bi derengî nekevin. Divê perwerdeyên xweparastinê ya jinan her tim di rojevê da be. Di hinek deman da nebûna xwedî derfetên ku jîyana madî ya jinan hêsan bike di xebatên rêxistinbûnê da xebata me zehmetir dike. Lê rêxistin, zanebûn, parvekirin destkeftina herî mezin e. Divê li vir hem ê ku rêxistin dike û hem jî ê ku rêxistin dibe zelal bibe. Hêsanbûna jîyana jinan, zêdebûna xweşguzarîya wan elbet daxwaza me ye jî. Û em ji bo vê têdikoşin. Îro derfeta herî mezin a ku em pêşkeşî jinan bikin rêxistin e, piştgirî ye, hevrêtî ye. Jîyaneka hîna xweş û muherif hîna zêdetir têkoşînê pêwîst dike. Lê jîyana herî xweş jiyîna bi awayekî azad, wekhev û birûmet e. Ev jî qasî nan û av pêwîstîyeka bingehîn e.

A duyemîn Şoreşa Rojava encax dema ku ber bi şoreşeka herêmî ve pêş bikeve dikare weke bîrdozîyî bijî. Îro di şertên hebûna HTŞê da şoreşa me ya jin di bin xeterîyê da ye. Divê em weke acil li ser derfetên avakirina îtîfaqeka jinê ya di seranserî Sûrîye da bisekinin. Li holê ye ku ji bo vê gelekî dereng hat mayin. Avakirina yekîtîya jinên ji netewên Kurd, Ereb, Suryan, Ermen, Tirkmen û hwd. erka herî acil e. Divê êrîşên li dijî jinan ku li tevahî bajarên Sûrî tên jiyîn her tim di rojeva me de be, divê bi awayekî berdewam pratîk û polîtîkayên dijminatîya jin ên HTŞê û çeteyên wê bên deşifre-aşkerekirin. Ger ku vîna yekbûyî ya jinên bindest ên ji her netew û bawerîyê derkeve dijî rejîma baviksalar a HTŞê wê demê gihaştina wê ya hedefa xwe dê ew qasî ne hêsan be. Em dikarin bi hêza jin a ku ji bo şoreşa jinê bûye yek HTŞê bifetisînin. Têkoşîna birêxistî ya jinan û evîna wan a azadîyê ji HTŞê û hevkarên wê yên mêtingehkar û emperyalîstan hîna mezintir e.

Em ê di 8ê Adarê da ji Rojava heta Siwêda, ji Şamê heta Latkîye û Hamayê bi tevahî jinan ra mil bi mil bisekinin. Em ê tu carî mehkûmî taritîya HTŞê nebin. Em ê têkoşîna xwe ya azadîya jinê weke hêzeka hilweşîner rêxistin bikin.

Em ê Bi Agirê Dîroka 8ê Adarê Şoreşa Xwe Biparêzin

8ê Adarê berî 168 salan di 1857an da roja ku jinên karker li bajarê Newyorkê yê girêdayî Emerîkayê li dijî şertên dermirovî yên xebatê û bi sedema li gorî mûçeya mêran kêm mûçe standina jinan dest bi grevê kirine û daxwaza mafên xwe kirin e. Weke bersiva vê girevê febrîqeya ku jin tê da dixebitîyan hate şewitandin û ji bo ku karker nikaribin derkevin derve derîyên febrîqeyê hatibûn qufilandin. Di ev berxwedana ku bi komkijîyeka jinê bi encam bû 129 jinên karker ji ber şewatê jîyana xwe ji dest dan. Ev berxwedana ku jinan mafa xwe ya şuxilîna di şertên mirovî da qîrkirin vegerîya yek ji bûyerên herî girîng ên dîroka cîhanê. Belkî ew jî ne di ferqa girîngîya wê rojê da bûn, lê di wê rojê da dîrokek dihat nivîsandin. Ev têkoşîna ku jinên karker ên Newyorkî didan meşandin ji alîyê Clara Zetkîn a ku yek ji rêberên komunîst a heyamê bû ve hat xistin rojevê. Di sala 1910an da li Kopenhagê Konferansa Jinên Kedkar kom bû. Clara Zetkînê di vê konferansê da çîroka ew jinên karker bi bîr xist û bangewazîya xwedî derketina jinên karker ên ku di wê bûyerê da jîyana xwe ji dest dane kir. Pêşnîyara rêbera jin a komunîst Clara Zetkîn weke roja jinên kedkar a cîhanê îlankirina 8ê Adarê bû.

100 jinên ku ji 17 welatên cuda tevlî vê konferansê bûn bi yekîtîya dengan pêşnîyar qebûl kirin. Piştî wê rojê her sal di 8ê Adarê da jinan li dera cîhanê çalakî çêkirin. Gelek mijarên wekî sererastkirina şertên şixul, dawî lê anîna tundîya li ser jinê, serhildana li dijî tacîz û destdirêjîyê, berxwedana li dijî dagirkerî û mêtingehkarîyê di her 8ê Adarê da bû mijara têkoşînê. Di dîroka têkoşîna çînayetî da jî, di dîroka têkoşînên azadîya neteweyî da jî 8ê Adarê cihekî girîng girt. Agirê gelekî şoreşan di 8ê Adaran da bi saya berxwedana jinan hat pêxistin.

Dema ku em ber bi 8ê Adarê ve diçin girîngîya têkoşîna rêxistinkirî careka din tê dîtin. Werin em bi hev ra li lewheyê binêrin. Li Sûrîye hêzên îslamker ên polîtîk hikûmetekî nû ava dikin û yek ji yekemîn daxuyanîya wan ew bû ku dê ji vê şunda zagonên şerîetê serdest be. Li bajarên mezin ên wekî Helebê sepanên şerîetê dest pê kirîye. Mînak di otobusan da li kêleka hev rûniştina jin û mêran hat qadexekirin, tena bi serê xwe derketina derve ya jinan dest pê kir, mecbûrîye ku jin li gel yekemîn mêrekî ku xizmê xwe derkeve. Yanê bêyî bav, bira an jî hevjînê xwe jin nikare derkeve derve. Ji bo ku karibin îspat bikin ku ev şexs bav, bira an jî hevjînê wê ye divê defter aîle li gel wan be. Ev zagon li ser navê sazkirina jîyanê tena çend qural in. A din jî di şer da jinên eydî mezheb û bawerîyên cuda weke xenîmeta şer tê dîtin. Kuştin, tacîz û tecawîzkirina van jinan 'caiz' tê qebûlkirin. Maf tê dayin çeteyan ku ew dikarin li dijî van jinan her cure sûcên dermirovî pêk bînin.

Em lêkolîna xwe ya lewheyê berdewam bikin û ber bi Rojhilat ve biçin: Li Îranê jinên ku bi dirûşmeya Jin Jîyan Azadî çembera agir pêxistin dema ku cîhan dihejand rejîma Melelî polîtîkayên xwe yên tahdekar berdewamkirin. Bi dehan jin hatin girtin û bi cezayê darvekirinê hatin cezakirin. Herî dawî di şexsê Pexşan Ezîzî da têkoşîna li dijî darvekirinê di rojevê da ye.

Em hinekî ber bi Bakur ve biçin: em bi dewleta Tirk a faşîst dagirker mêtingehkar ve rastî hev tên. Tena di sala 2014an da 498 jin ji alîyê mêran ve hatin qetilkirin. Gelek zarokên keçîn ên wekî Narîna 8 salî hatin qetilkirin. Yê ku jinan qetil dike, polîtîkayên pergala serdestîya mêr rewa dibîne û heta yê ku vê rêxistin dike polîtîkaya dewletê bi xwe ye. Em di vê lewheyê da li cihên hîna dûrtir binêrin: Mînak li Efxanîstana ku hevşêweya DAIŞê lê serdest e mafên herî bingehîn ên jinan hatin qedexekirin. Her roj bi zagoneka cuda jîyana jinan tê sînordarkirin. Ji bo jinan derketina derve, xwendin, xebitîn, perwerdebûn, temaşakirina telvezîyon, guhdarkirina radyo û hwd. hate qedexekirin. Zagona herî dawî ya ku hatîye derxistin jî "divê di dorhêlên ku jin lê ne şibake tune be"

Em ji alîyê Başûr ve li lewheyê binêrin: em li wir erdnigarîya Filistîn û Lubnanê ya ku di nav şer, dagirkerî û berxwedanê da ye dibînin. Ji ber sîyonîzm û emperyalîyetê jinên bêhejmar koçberbûn, hatin qetilkirin, rastî tacîz û tecawîzê hatin.

Em tevahîya vê lewheyê bînin ber çavê xwe careka din bifikirin. Gelo 8ê Adarê ji bo jinên Rojavayî çima girîng e?

Îro girîngîya 8ê Adarê ev e: sedsala 21emîn serdema serhildanên jinê ye. Di hemû berxedanên ku mohra xwe li vê serdemê bixe da, dê têkoşîna azadîya jinê rola xwe ya esasî bilîze. Di tevahî cîhanê da bilindkirina têkoşîna azadîya jinê, li dijî dagirkerî, sîyonîzm, emperyalîzm, faşîzm, kapîtalîzm û hetereseksîzmê bilindkirina têkoşînê ye. Ji ber ku aşkere ye ku jin ne dikare di civaka ku di bin feraseta pergala mêrperest da rêxistin dibe, ne jî dikare bi avanîyên dewletên kapîtalîst ku vê rêxistin dike bi hev ra bijî.

Êdî guhertineka şoreşger ji her tiştî hîna zêdetir pêwîst e. Mînaka herî xweş ku ji bo vê bê dayin şoreşa Rojava ye. Jinan li Rojava û axên Bakur û Rojhilatê Sûrîye ji şer heta sîyasetê bi avanîya xwe ya rêxistinkirî xweserîya xwe rêxistin kirîye. Elbet kêmasîyên şoreşa me hene û li dijî serdestîya mêr têkoşîn berdewam dike. Dema ki di alîyekî da, di nav lewheya cîhanê da polîtîkayên dijminatîya jinê roj bi roj zêde dibin, lê di alîyê din da şoreşa Rojava stêrkeka ku dibiriqe ye. Ji bo tevahî gelên cîhanê dibe hêvî. Yekane mezinkirina vê hêvîyê jî xurtkirina rêxistinbûna jinê ye. Ji bo parastina şoreşê û rizgarîya xwe divê em rêxistin bibin.

Di 8ê Adarê da em li ku dibin bila bibin roja ku hêza jinên cîhanê dibe yek e, jin di vê rojê da dizivirin kulmekê. Ji ber vê yekê em ê li bendava Tişrînê, parastina şoreşa xwe ya jinê berdewam bikin. Em li Kobanê parastina şoreşa jin berdewam bikin. Em ê li Qereqozaxê parastina şoreşa jinê berdewam bikin! em ê li Hesekê, Qamişlo, Til Temir û Dêrîkê, li her bajarî parastina şoreşa jin berdewam bikin. Eynî weke 168 sal berê, belkî wan jinan dema ku derketin girevê ne di wê ferqê da bûn ku wê rojê dîrokê dinivîsin, lê rêbera jin a komunîst Clara Zetkîn û hevrêyên xwe rewş cuda rêxistinkirin. Weke jinên komunîst, wekî her sal di 8ê Adara îsal da jî em ê li kolanan bin û em ê li dijî dagirkeran dîrok binivîsin. Ji bo vê şoreşê jinan bi awayekî bêhejmar canê xwe fida kirin. Ên ku bi diran û nênûkên xwe ev şoreş ava kirin em jin bûn. Em ê şoreşa xwe ne ji dewleta Tirk a mêtingehkar ra, ne ji emperyalîstan ra ne jî ji Colanî û çeteyên wî ra nahêlin.

Dîrok Bingeha Pêşerojê ye

Li Sûrîye jî dîroka bindestîya jinan dispêre civakên biçîn. Piştî hilweşîna Împaratorîya Osmanî axên Sûrîye dikeve bin dagirkerîya Fransayê. Fransa di wê heyamê da weke hêzeka mêtingehkar li ser axên Sûrîye pergala mandateriyê ava dike. Hîmên pergala mandateriyê jî li ser rastîya baviksalarîyê tê avakirin. Sûrîye heta 1946an di bin dagirkerîya Fransayê da dimîne. Di sala 1946an da Sûrîye serxwebûna xwe bi dest dixe. Di wan salan da hikûmet û pergala nû tê avakirin. Dîroka avakirina partîyê BAAS jî hema hema dirêjî vê dîrokê dibe. Partîyê BAAS di salên 1960an û şunda bi derbeyeka leşgerî desthilatdarîyê bi dest dixe. Pergala xwe li ser esasa kapîtalîzm mêtingehkarî û serdestîya mêr ava dike. Jinên ku heta wê demê di şer û têkoşînên serxwebûnê ya li dijî mêtingehkarîya Fransayê da cih girtibûn di pergala nû ya rejîma BAASê da careka din tune tên hesibandin.

Di rejîma BAAS da jin her tim weke bireser hatîye girtin dest. Hemû desthiladarî li ser bingeha serdestîya mêr hatîye avakirin û bingeha vê sîyasetê bi rêya makezagonê hatîye xurtkirin. Di van zagonan da mafa jinê ya mîras, mafa jinê ya "gotin çalakî rêxistinbûnê" tunebû. Jinan her çiqasî bi saya têkoşînên xwe hinek maf bi dest xistibin jî rejîma kapîtalîst mêtingehkar mêrperest di jîyana civakî da hebûna jinan bi rêya van zagonan, çanda malbatî û eşîrtî tune hesiband. Tenê jinên ku dibûn endamên partîya BAASî dikarîbûn di sîyasetê da cih bigirin an jî di sazîyên dewletê da bixebitin. Mafa sîyasetê tenê di partîyê BAAS da derbasdar bû. Pîşeyên ku jinan dikarîbû bi dest bixin tena mamostetî an jî qada tenduristîyê bû. Heta li ber zagonan li dijî şahidîya mêrekî şahidîya du jinan pêwîst bû. Di nav jinên ji netew, bawerî û kêmnetewên Sûrî da beşek ji jinên ku herî zêde tade didît jî jinên Kurd bûn. Ji ber sîyaseta bênasname hiştina netewa Kurd a rejîma BAAS tadeya herî mezin jî jinan jîyan dikirin. Ji jîyana civakî bigire heta jîyana sîyasî cihê ku rejîma BAAS ji jinê ra rewa dît nava çar dîwaran, welidandin û xwedîkirina zarokan û xizmetkirina mêr bû.

Şoreşa Rojava bû Çirûska Azadîyê

Dewleta Sûrîye ya mêtingehkar yek ji dewletên ku parçeyekî Kurdistanê di bin nîra mêtingehkarîyê da digirt bû. Lê neteweya Kurd wekî parçeyên li parçeyên din ên Kurdistanê, li Rojavayê Kurdistanê jî li dijî mêtingehkarîya rejîma BAAS jî dev ji berxwedana xwe bernedan. Jinên Kurd bi taybetî di sala 1990an da bi awayekî girseyî tevlî têkoşîna rizgarîyê bûn. Jinên bi awayekî girseyî berê xwe dan çîyayên azad di heman demê da bûn bingeha şoreşa jinê. Bi taybetî komkujîya 12ê Adarê ya stada Qamişlo ya ku dibe teqîna serhildanên gelê Kurd di dîroka têkoşîna gelê Rojavayê Kurdistanê da di milê rêxistinbûnê da jî dibe xaleka werçerxê.

Jinên Kurd jî li gel rêxistinbûnên gel bi rêya meclîsên gel, meclîsên jinan û Yekîtîya Star têkoşîna xwe gur dikin. Dema ku di sala 2011an da agirê serhildanên gelê Ereb tevahî Rojhilata Navîn û dîktatorîyên mêrperst dorpêç dike dîktatorîya rejîma BAAS jî ji ev agirê serhildanê para xwe digire. Dema ku agirê serhildanê digihêje Sûrîye, gel û jinên Kurd ên Rojavayê Kurdistanê bi rêxistinên xwe yên cewherî vê pêvajoyê pêşwazî dikin. Bi taybetî jî bi awayekî xurt rêxistinbûna jinan dibe bingeha şoreşa Rojava ya jin. Şoreşa Rojava ya jin bi pergala xwe ya rêxistinbûna jin, bi pergala hevserokatî, kota, zagonên jinê di tevahîya cîhanê da bû çirûska azadîya jinê. Bi mîrasê şoreşên sedsala 20emîn bû pêşenga sedsala 21emîn a serdema şoreşên jin.

Bingeha HTŞê û Parastina Destkeftinan

Di alîyekî da gelê Kurd û jinên Kurd agirê serhildanên gelê Ereb ê digêhêje Sûrîye li Rojavayê Kurdistanê bi saya pêşengtîya şoreşger û hêza rêxistinî bi şoreşê tacîdar dikin. Lê di alîyê din da li bajarên din ên Sûrîye rejîma BAAS bi awayekî hov êrîşî ser çalakvanan dike. Piştî vê pêvajoyê bi mudaxeleya dewletên emperyalîst û hêzên paşverû yên herêmê ev pêvajo tê zivirandin şerekî navxweyî.

Dîroka Heyet Tahrîr El Şam (HTŞ) ya ku di 8ê Adara 2024an da bi piştgirîya dewletên emperyalîst û dewletên herêmê yên Tirkîye û Îsraîl bajarê Şamê xist bin destê xwe, dîroka DAIŞê ye. Cephet El Nûsraya ku di sala 2013an da navê xwe guhert û kir DAÎŞ bingeha xwe ji El Qeyde digire. Colanîyê ku qaşo di 'konferansa serkeftinê' da xwe weke serokomar îlan kir di Sûrî da avakerê DAIŞê yê yekemîn e. DAIŞa ku bi pêşengtîya Colanîyê ku qaşo serokomarê Sûrîyeya nû ye hate avakirin ji Şengalê heta Kobanê mohra xwe li dijminatîya jinê xist. Avakerê yekemîn DAIŞê Colanîyê ku ji Kobanê heta Reqa, Minbic, Dêrazor û hwd bi pêşengtîya jinan bin ket îro piştî ku bi lîstokeka navneteweyî ya emperyalîst bû desthilatdar bi rêya sepandina zagonên şerîetê dixwaze ku tola ew binketina xwe ya dîrokî ji jinan rake. HTŞê piştî ku desthilatdarî bi dest xist hîna di rojên xwe yên yekemîn da ragihandin ku dê pergala 'Sûrîyeya Nû' da zagonên şerîtê bi cih bînin. Di hikûmeta demkî ya ku ragihandin da erkdarkirina kujerê Hevrîn Xelefa ku yek ji pêşengên şoreşa jinê bû ji bo tevahî jinan mesajeka. Dîsa weke wezîrê edaletê erkdarkirina çeteyê bi navê El Weysîyê ku li Idlîbê dadgerê Şerîetê bû û li ber çavê cîhanê bi sedema zînayê jin îdamkirin mesajeka ji bo hemû jinan e. Daxuyanîya Eyşe El Dibs ku ji Tirkîye anîn û kirin wezîrê ofîsa jin a "dê zagonên şerîetê bên sepandin, kesê ku li gorî vê nemeşin em ê qebûl nekin" sîyaseta ku HTŞê piştî vê bide meşandin nîşan dide.

Li Dijî Tarîtîya Çeteyên Cîhadîst Têkoşîna Yekbûyî

Dewletên emperyalîst ên wekî Emerîka, dewletên faşîst mêtingehkar paşverû yên herêmê yên wekî Tirkîye, Îsraîl hwd. ku di hilweşîna dîktatorîya BAAS da rol lîstin û li dewsa wê çeteyên cîhadîst di bin siwana HTŞê da komkirin û pê desthiltdarîyeka nû avakirin dixwazin şoreşa Rojava û şoreşa jinê ji çar alî da dorpêç bikin bifetisînin.

Li Şam, Humus, Halep, Hama, Lazkîye, bajarên din ên Sûrîye jîyana tevahî jinan û gelên bindest di bin xeterîyê da ye. Di bin navê paqijkirina bermayîyên rejîma BAAS da rojane gel û jinên Elewî tên qetilkirin. Tê xwestin ku tarîtîya 5 hezar salan ji nû ve li ser me bê ferzkirin û destkeftinên ku me bi bedelên gelekî mezin bi dest xistine destesar bikin. ev li dijî şoreşa me ya demokratîk û azadîxwezîya jin di rola dijşoreşê da ye.

Em li dijî vê tenê bi rêya têkoşîneka yekbûyî ya jinan dikarin bisekinin. Erka vê pêvajoyê ya herî girîng di her qadê da xurtkirin û avakirina yekîtîya jinên bindest ên Kurd, Ereb, Elewî, Ermen, Suryan, Aşûrî, Tirkmen, Çerkez, Êzidî û hwd. ye. Yekîtîya me hêza me ye.

Pêwîst e ku em li ser vê bingehê 8ê Adarê roja jinên kedkar a pêşwazî bikin. Li dijî tevahî êrîşên dagirkerîyê divê em bi rihê berxwedana Qereqozax û Tişrînê li her derê destkeftinên xwe biparêzin.

Tiştê Ku Em Hemû Tê De Zelal in Zindî Neketina Destê Dijmin e

Gelên Sûrîye bi hilweşîna rejîma Esad ket pêvajoyeka şer. Di vê pêvajoyê da li ser şoreşa jinê ya Rojava êrîşên gelekî cidî hene. Ji Kobanê heta Deyr Hafir her der li dijî dagirkerî û çeteyên dewleta Tirk li ber xwe dide. Me bi şervanên Tabura Şehîd Serkan ku ji destpêka şoreşa Rojava da li cepheyan şer dike bi şervanên Tabûra Jin a Avaşîn Têkoşîn a Hesekê ra pêvajo nirxand.

Dembaş hûn weke şervanên jin ên Tabûra Şehîd Serkan dikarin pêvajoyê û êrîşan binirxînin?

Awaz: Dembaş. Berî ku em dest bi gotinên xwe bikin ez şervanên ku di ev rojên berxwedanê da, şervanên ku ji bo parastina destkeftinên jin û axên şoreşê bûne nemir û yên ku di berxwedana Tişrînê da şehîd ketine bi bîr tînim. Em soz didin gelên xwe, dê xwîna wan li erdê nemîne, em ê tola wan rakin. Bi hilweşîna rejîma Esad ji nû ve parvekirina axên Sûrîye mijara gotinê ye. Dewleta Tirk a mêtingehkar di xema par girtina ji axên Sûrî da ye. Di destpêka pêvajoyê da Şehbaya ku koçberên Efrîna ku di sala 2018an da dagir kiribû lê yekîtîya xwe berdewam dikirin û bajarê Minbicê hatibû dagirkirin.

Ji 8ê Kanûnê vir ve jî li xeta Tişrîn, Qereqozax û Dêr Hefirê bexwedana destanî ya şervanên YPJê, QSDê û Tabûra Şehîd Serkan berdewam dike. Rejîma Esad a 60 salî bi destê Emerîkayê di 10 rojan da radestî HTŞê kirin. Colanîyê ku rêbertî ji koma çete ya El Nûsra ra kirîye îro weke rêberê nû yê rejîma Sûrîye pêşkeşî cîhanê tê kirin. Di alîyekî da HTŞê û Colanî di bin navê îslama nerm da di sehneyê da tê bicihkirin, di alîyê din da komkujîyên li ser Elewîyan berdewam dike. Destpêkê li Tertûs û Lazkîye komkujîyên li ser elewîyan li ber çavên hemû cîhanê berdewam dike.

Di navbera van hemû bûyeran da Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîye ji bo parastina axên xwe û di nav ev şerê parvekirina ji nû ve ji li ser pêyan girtina şoreşa Rojava ya jin hevdîtinên xwe berdewam dike. Dewleta Tirk a ku xwedî teknîkeka pêşketîye 60 roja nikare bendava Tişrînê derbas bike. Şervanên YPJê, QSD û Tabûra Şehîd Serkan li dijî balafirên keşfê yên pêşketî dronên xwe çêdikin, di tunelên şer da li dijî hemû zehmetîyan bi vîn û biryardarîyeka mezin li ber xwe didin.

Tabûra we di kîjan cephe û pêngavan da cih girt? Weke jin di van cepheyan da lêbihbûna we çawa bû?

Barîn: Heta niha me weke şervanên tabûrê di şerên Dêr Hefir, Qereqozax, Tişrîn û parastina cepheya Kobanê da cih girt. Em weke şervanên jin di van cepheyan da di şaxên sûeqest û sabotajê da rasterast cih digirin. Em li dijî çeteyên dewleta Tirk a dagirker tevlî operasyonên ku di van cepheyan da tên kirin dibin. Ya rastî berxwedana ku em weke jin li dijî çeteyan didin meşandin xwedî wateyeka hîna mezintir e.

Êrîşa çeteyên dagirker û dewleta Tirk ên li ser şoreşê berdewam in. Weke şervanên jin ên komunîst wateya cihgirtina di cepheyên herî pêş da çiye?

Awaz: Em weke şervanên jin li dijî dewleta Tirk û çeteyên wê bi hêrs û biryardarîyeka mezin şer dikin. Ji ber ku hîna di ser rojên ku van çeteyan li Şengalê jin weke koleyên seksê derxistin bazaran û li Minbicê jinên birîndar dîlgirtin û şkenceyên cureyî li wan kirin da demeka gelekî dirêj derbas nebû. Em dijminê xwe baş nas dikin û şerê xwe jî bi vê zanebûnê didin meşandin.

Hûn dikarin çend tecrûbeyên xwe yên ku dema we bi çeteyên îslamker ên polîtîk ra şer dikir bi me ra parve bikin?

Barîn: Niha weke jinên ku di cepheya Tişrînê da cih digirin. Berî demeka kin em tevlî operasyoneka li dijî çeteyan bûn. Di destpêka operasyonê pê ve me weke şervanên jin bi xwestek û biryardarîyeka mezin di vê operasyonê da cih girt. Em di dûrahîyeka ku em dengê tekbîra çeteyan jî, piştî gule û mayinên xwe tirs û qîrîna wan a di nav êşê da bibihîzîn da ne. Weke şervanên jin dema ku em diçûn operasyonê me bombeyeka xwe ya destan di bêrîka xwe da bir. Ji ber ku tiştê ku em hemû tê da gelekî zelal in zindî neketina destê dijmin e. Wayê tu kes nikaribe vê vînê û biryardarîyê têk bibe. Em dizanin ku îxanet dibe radestbûnê, berxwedan dibe serkeftinê.

Li Tişrînê berxwedaneka mezin a gel heye. Vê berxwedanê bandoreka çawa li ser we kir?

Barîn: Berxwedana ku li vir tê meşandin ne serbixweyî berxwedana ku li bendava Tişrînê gel singa xwe dide ber mirinê û dimeşîne ye. Ger gel xwedî li zarokên xwe derneketibana li vir ev du meh in berxwedan ew qasî xurt nedibû. Em ji berxwedana gelê xwe hêzeka mezin digirin. Gelên me jî bi hêza berxwedana me mezin li ber xwe dide. Yanê bi esasî em hev temam dikin. Di eslê xwe da gotina me ya şerekî gel ê komî tê meşandin ne şaş e. Ji zarokan heta kal û pîran herkes bi vê berxwedanê ra têkilîyeka rasterast ava dike. Bi vî awayî rastîya ku ev şoreş şoreşa gelan e careka din tê îspatkirin.

Bangewazîya we ya ji welatparêzên Rojavayî û jinên li derdora JKŞê ra bangewazîya we çiye?

Awaz: Destpêkê ez hevrê Avaşîn Têkoşîn Guneşa ku di sala 2015an da di şerê li dijî çeteyên DAIŞê şer dikir şehîd ket bi bîr tînim. Ez 8ê Adarê roja cîhanî ya jinên kedkar a hemû jinan pîroz dikim. Şoreşa Rojava ya jin ji bo tevahî jinan wateya azadî û mirovatîyê ye. Ev şoreş ronahîya hêvîyê ya tevahî jinan û bindestan e. Divê em weke ragirên agir agirê şoreşê gur bikin. Pêwîst e ku herkes di taburên parastina cewherî da cih bigire. Divê hemû jin li dijî dijminên şoreşê sîleh rakin. Ev ji vir şervanên tabûra Avaşîn Têkoşîn Guneş silav dikin. Em bangewazîya hemû jinan dikin ku di taburên komunîstên Rojavayî da cih bigirin û ji bo parastina şoreşê şer bikin.

Avaşîn Têkoşîn Rengê Berxwedanê yê Vê Şoreşê ye

Dema ku êrîşên dewleta Tirk û çeteyên girêdayî wê li ser axên Rojava – Bakur û Rojhilatê Sûrîye berdewam dikir li Hesekê jinên Kurd û Ereb tabura Avaşîn Têkoşîn Guneş ava kirin. Em bi Emel Ibrahîma ku yek ji şervanên tabûrê ye li ser avabûna tabûrê axivîn.

Emel: Avaşîn Têkoşîn Guneş komunîsteka Efrîqî bû. Ji bo ku li dijî çeteyên DAIŞê şer bike û şoreşê biparêze ji Elmanyayê hat Rojava. Li cepheya Til Temirê berî rojekê ya 8ê Adarê dema ku bi çeteyan ra şer dikir bû nemir. Çeteyên girêdayî dewleta Tirk êrîşa axên şoreşê dikin û dixwazin şoreşa jinê hilweşînin. Me weke jinên JKŞyî ji bo parastina şoreşa xwe tabûra xwe ava kir. Em ê di şopa hevrê Îvana da weke jinên Kurd, Ereb, Ermen, Tirkmen, Suryan û hwd. mil bi mil şer bikin û bibin rengê berxwedanê yê vê şoreşê.

Eyşe Şan; Li Dijî Çanda Eşîrtîyê Jineka Têkoşer

Eyşe Şan di sala 1938an da li bajarê Amedê hat dinyayê. Di nav malbateka Kurmanc da wekî jineka Kurd mezin bû. Ji dîrokê da heta niha li Kurdistanê jin di bin bandora çand û teqelîdên eşîran da dijîn. Jîyana hemû jinan wekî hev in, dişibe hev. Eyşe Şan jî li bajarê Amedê di dorpêça çanda eşîrtî da hate dinyayê. Dema ku bavê xwe jîyana xwe ji dest da ew hîna 9 salî bû. Heta wê rojê di nav meclîsa dengbêjan da stranên qedîm guhdar dikir. Wê jî dixwast bibe dengbêjeka jin. Piştî ku bavê Eyşe mir jîyana wê bêtir zahmet bû. Di nav eşîra wê da fikra feodalîzmê pir kûr bû. Li gorî zagona eşîrên feodal stranbêjbûyîna jinan pir eyb û şerm bû. ji ber vê yekê Eyşe bere xwe da bajarên din. Eyşe destpêkê li Dîlokê piştre jî di sala 1963an da li Stenbolê jîya. Li vir gav bi gav xeyala xwe ya zaroktî pêk anî û dest bi hunermendîyê kir.

Destpêkê li Dîlokê di radyoyekî herêmî da xebitî, piştî vê çû Stembolê. Li vir konserên bi zimanê Tirkî û Kurdî li dar xist. Strana xwe ya 'Ez Xezal im' pir navdar bû. Dema ku stranên Kurdî got dexta li ser wê hîn zêdetir bû. Ên ku Eyşe Şan nas dikirin her ku çû zêde bûn. Dewleta Tirk a mêtingehkar jî zilm û zext li ser Eyşe Şan dikir. Eyşe alîyekî li dijî çanda eşîr û teqelîdên paşverû tedikoşîya, li alîyekî jî li dijî dewleta faşîst li ber xwe dida. Lê zilm û zexta li ser wê ew qasî zêde bû ku Eyşe Şan ji ber vê yekê berê xwe da Elmanyayê. Li Elmanyayê di şert û mercên koçberîyê da jîya. Ev jîyan pir zehmet bû. Li ser vê zehmetîyê keçika xwe ya piçûk jî mir. Emrê keçika xwe hîna 1.5 bû. Ji ber vê dilê Eyşe Şen pir êşîya. Derd û êşa xwe bi strana 'Qederê' ra anî ser ziman. Ên ku ew guhdar dikirin ji dengê Eyşê Şan pir bandor dibûn. Piştî demekê dîsa vegerîya Stanbolê û li vir sê keçikên xwe din çêbûn.

Bajarê Bexdayê Derîyê Navdarîyê Vekir

Li Stenbolê zexta dewleta Tirk a li ser Eyşe Şan qut nebû. Di sala 1979an da bi saya dostên xwe yên hunermend çû bajarê Bexdayê. Li vir bi navê Eyşanê Elî di radyoyê Dengê Bexdayê da tevlî weşanan bû. Walîyê Bexdayê dema ku dengê Eyşe bihîst pir bandor bû û ew vexwand bajarê Hewlerê. Li vir bi hunermend Mihemed Arîf Cizwarî û Îsa Berwarî ra naskirina xwe çêbû. Her sê hunermend bi hev ra li bajarên Başûrê Kurdistanê konser lidarxistin. Hunermend Cizwarî ji jîyana Eyşe Şan ew qasî bandor dibe ku di nav strana xwe da behsa heyranîya xwe ya wê dike. Mîna bi gotina 'Lê lê Eyşanê lê wayê lê wayê çav biçûk wayê' ra di nav strana xwe daye cih dide Eyşe Şan.

Eyşe Şan bi taybetî li Bakur û Başûrê Kurdistanê hûnermendeka pir nevdar bû. Lê çiqasî navdar be jî li ser wê gefên malbata xwe berdewam dike. Hem li Stenbolê, hem li Elmanyayê hem li Hewlêrê malbata wê şopa wê berneda. Li her derê gefa kuştinê li wê dixwin. Ji ber ku li gorî çanda eşîrê di nav mêran da stran gotina jinan mijareka pir eyb bû. Dema ku denga Eyşe di rodyoyê da derket herkesî denga wê nas kir. Ji ber vê yekê Eyşe ji alîyê eşîra xwe ve weke jineka bêedep û bênamûs hate îlankirin. Di nav malbatê da tenê dayika xwe li pişta Eyşe Şan disekine. Lê ew jî li dijî zagona eşîrê neçar dimîne. Eşîra wê nehîşt hatina Eyşe ya bajarê xwe qedexe kir. Dema ku dayika wê jîyana xwe ji dest dide malbata wê ji bo Eyşe serlêdana gora dayika xwe qedexe dike. Ew pir li zora Eyşe diçe. Dilê xwe ew qasî diêşe ku li ser dayika xwe stranekê dibêje. Strana 'Dayikê' di dilê gelên Kurmanc da birîneka kûr vedike. Di her çar parçeyê Kurdistanê bi dengê Eyşe Şan êşa jinan tê ser ziman. Zilm, dexta eşîrê, tundî, şer, koçberî, berpirsîyatîya dayiktî û hwd. di stranên wê da rastîya jîyana jinên Kurd hebû.

Ji ber vê gelên Kurmanc Eyşe Şan hemêz kir. Eyşe Şan jî erkên ku dabû ser milên xwe dizanî. Ew jineka azad û welatparêz bû. Rastîya neteweyên bindest û zilma dewletên mêtingehkar pir baş nas dikir. Di Gotineka xwe da wisa dibêje ' Bindestî bi xwe ra êşeka mezin diafirîne. Ger ku welatekî me jî azad hebana gelê me qîmeta nirxên xwe dizanî bû. Em ê fidayî bindestîya welat û gelê xwe bibin.'

Eyşe Şan di sala 1996an da li İzmirê ji ber nexweşîya penceşêrê jîyana xwe dest daye. Wasîyetê wê dema ku mir li Amedê hatin veşartin bû. Lê eşîra wê piştî ku ew mir jî nehişt ku ew vegere Amedê. Wê wekî mîras bi dehan stranên xwe ji me ra hişt. Jîyana xwe bi têkoşîna li dijî paşverûtîya eşîrtî û çanda feodalîzmê derbas bû. Dê denga wê ji me ra bibe şîret.

Ala Rojava Hilde Şoreşa Jin Biparêze!

Me di dîroka cîhanê da, şoreşa xwe ya jin da nivîsandin. Li cîhanê cara yekane weke şoreşek jin, jinan li Rojava xwe bi rêxistin kirin û bûn pêşeng. Ji artêşbûnê heta saziyên din ên şoreşê jinan dîroka xwe bi têkoşînê xêz kirin û ji hemû jinên bindest ra bûn mînak.

Şoreşa me ya Rojava ji bo me jinan û bi taybet ji bo jinên ciwan destkeftîyeka herî mezin e. Me bi saya vê şoreşê vîna xwe xurt kir û bi vê yekê me dengê jinan gihand hemû cîhanê. Ji destpêka geşedana agirê şoreşa Rojava, jinan dest bi kar û xebatên xwe kirin. Jinên ciwan ji bo pêşxistina vê şoreşê di her qadê da, di her kar û çalakiyê da cih girtin. Ji artêşa jin heta saziyên jin yên xweser di her derê da rengê jina têkoşer hat dîyarkirin. Jinên ciwan di dema ku pêwîst bû şer bikin, têkoşîn û hêza jin bidin pêş, berê xwe dan çek û silah û di qadan da, di nav artêşên jin yên xweser da vîna jina azadîxwaz derxistin pêş. Mînaka herî li pêş me ew e ku jinên Rojavayî, jinên çar parçeyê Kurdistanê û jinên çar alîyê cîhanê li hemberî tarîtîya DAIŞê serî netewandin û di şerê Kobanê, Reqa, Minbic û hwd. berxwedaneka bêhempa meşand.

Jinên Ciwan Pêşeroja Şoreşa Jinê ne!

Jinên ciwan bi vîna xwe ya şoreşger DAIŞ têk birin û bi vî awayî gel û welatê xwe rizgar kirin. Me dît di dema ku pergala mêrperst, baviksalar û cîhadîst xwest ku jinan ji xwe ra bike meta, koleyên seksê û amûrekî tenê ji bo xizmetê jinan li hemberî vê serî netewandin. Jinan, bi taybetî jî jinên ciwan hîna zêdetir xwe di nav sazîyên şoreşê da bi cih kirin, rêxistinbûna xwe xurtir kirin û bi têkoşîna xwe serî rakir û xwe zêdetir azad kir. Di her gavên şoreşê da me rola jinan dît û hîna jî ked û hebûna jinan a di vê şoreşê da hîmê herî xurt ê şoreşê ye. Di hemû sazîyên şoreşa me ya Rojava ya jin da û bi taybetî jinên ciwan roleka girîng lîstin. Me di vê şoreşê da destkeftiyên dîrokî bi dest xist.

Îro roj di hemû civaka Rojava da bingeha Rêveberîya Xweser bi pêşengtîya jinan ava bûye. Bi destxistina azadiya jin me di nava jîyane da guhertin dîtin. Gelek karên ku tenê eydî jin dihatin dîtin, bûn karên hevbeş. Gelek zagonên ku koletîya jinê kûrtir dikirin hatin rakirin û li dijî wê di nava vê şoreşê da gelek zagon û biryarên ji bo parastina mafê jin hatin derxistin. Piştî şoreşa me ya jin, di dibistanan da rêjeya jinên ciwan hîna zêdetir bû. Ev bû derfeteka hîna bêtir xwe pêşxistinê. Jinan bi saya vê pêşketinê li dijî pergala baviksalar û serdestîya mêr zanebûna xwe ya zayendî pêş xist û li dijî vê ket nava têkoşîneka berfirehtir. Ji ber vê yekê şoreşa me ji tevahî jinan ra bû derfeta mezin da ku karibin ji bo azadîya xwe rabin ser pêyan û têkoşîna xwe mezintir bikin. Di her demê da dewletên ku li ser hîmê serdestîya mêr ava bûne dixwazin jinan dîsa vegerînin koleyên xwe. Jinan tenê weke makîneyeka welidandina zarokan, xwedîkirina zarokan, kar û xebata malê û xizmetkareka mêr dibînin. Lê îro şoreşa Rojava nîşanî hemû cîhanê da ku, ger di nava civakê da dema ku bibe bingeha esasî ya jîyanê, pergal li ser wekhevîtî û edaletê bê avakirin, wê demê ew civak dikare were guhertin. Wê demê em dikarin bi awayekî azad û wekhev bijîn. Ji ber ku jin esasê her tiştî ye.

Em ê Rê Nedin Tarîtîya Çeteyên Cîhadîst

Niha dîsa piştî ewqasî têkoşîna me dewletên emperyalîst, kapîtalîst û paşverû bi rêya îslamkerîya polîtîk dixwazin jinê bixin bin kontrola xwe û ji nû ve me bikin koleyên xwe da ku karibe şerê xwe, dagirkerîya xwe li ser welatên bindestan ferz bike. Ji ber vê yekê niha weke ku em dibînin bi taybetî li Sûrîye çeteyên cîhadîst ên xwedî hişmendîyeka baviksalar derdixe pêş. Di bin rêveberîya HTŞê da ji nû ve dixwazin ku jinan bikin kole. Dixwazin ku şoreşa jin bin bixin. Ew baş dizanin ev şoreş ji hemû jinan ra bûye piştgirî û hêza herî esasî. Ew dizanin ku bi saya vê berxwedan û têkoşînê jinan gelek mafên xwe bi dest xistin. Îro bi destê çeteyên HTŞê dixwazin tarîtîya şerîetê li ser jinan bê ferzkirin. Lê em ê dev ji têkoşîna xwe bernedin û rê nedin tarîtîya çeteyên cîhadîst.

Em ê Tirsa Wan Mezintir Bikin!

Tirsa wan ew e ku hemû jin bi pêşengtîya Şoreşa Rojava ya jinê, têkoşîna xwe mezintir bikin û li cîhanê belav bikin. Tirsa wan ew e ku ew ê bi destê jinan werin têk biçin. Erê rast e ew ji hêza jinan pir ditirsin. Ew dibînin ku jinên me yên ciwan çawa li şoreşa xwe xwedî derdikevin, çawa ji bo pêşxistina xwe hîna zêdetir xwe bi rêxistin dikin, çawa li hemberî wan şer dikin. Ew ji dengê tilîlîya jinên azad û berxwedêr ên li Bendava Tişrînê ditirsin, ji vîna jinên çekdar ditirsin. Îro em dibînîn çawa jinên ciwan bi erkên xwe xwedî li şoreşa xwe derdikevin, li bendava Tişrînê dibin mertalên têkoşîn û berxwedanê, dibin tirsa dilê dijmin. Ew ji gelekî mafdar in ku ji hêz vîna me ew qasî bitirsin. Ji ber ku me li dijî teknîk, balafir û her cure êrîşên wan dîwarên tirsê hilweşandin em ê bi dirûşmeya “em ji mirinê mezintirin" rûyê erdê ji wan ra teng bikin û em ê bi hêz, bawerî û rêxistinbûna xwe, bi şerkerîya xwe rûyê erdê ji wan ra bikin goristan.

Me hêz û vîna xwe ji dîroka têkoşînê girtiye, ji dîroka 8ê Adarê girtiye. Em ê vê têkoşîna xwe her tim xurt û xurtir bikin. Em ê berxwedana xwe ya dîrokî careka din nû bikin. Em ê li ser soza xwe ya ku ma daye nemirên xwe bimînin. Em ê ji bo jîyaneka azad û wekhev bi fidakarî bixebitin. Xwişkên min, şoreşa me bi têkoşîna me ava bû, bi xwîna jinên azad û berxwedêr bi ser ket. Îro roj roja me ye, roja xêzkirina dîrokê ye. Em ê bi hev ra, mil bi mil dîsa têbikoşin, em ê berxwedana xwe mezin bikin, ger pêwîst be em ê bibin mertal û li bendava xwe dijmin bi dîlan û tilîliya xwe têk bibin, ger pêwîst be em ê di nav QSDê, YPJê bi cih bibin û dijmin bi vîna xwe ya çekdarî têk bibin. Û îro li ser vê pêwîstîyê em vê erka xwe ya girtina di nava QSDê, YPJ û tabûrên gel da bi cih tînin jî. Em weke jin bûn pêşengên vê şoreşê. Em ê bi berxwedana xwe binin dîroka hebûn û tunebûnê. Em ê bi hev ra bi rihê têkoşîna 8ê Adarê, berxwedana bendava Tişrînê, ji niha ve dîroka xwe binivîsin û serkeftina xwe misoger bikin. Çi dibe bila bibe em ê dev ji şoreşa xwe bernadin.

JKŞê li taxan di nav jinan da perwerdeya sîleh berdewam kir. Li Qamişlo, Hesekê û Kobanê jinên ku perwerdeya sîlehê girtin ji bo parastina bajarên xwe derketin nobetê.

Endamên JKŞ'ê di salvegera şehadeta pêşenga jin a şoreşger Rosa Lûksembûrg de bîranînek li dar xist. Bîranîn bi deqek rêzgirtin hate destpêkirin.

